



# YPJ STAR

Kovara Mehane Ya Birdozî, Çandî û Leşkerî

Hejmar: 85/Çile/ Sal: 2023

# JIN JIYAN AZADÎ



## ŞOREŞA ME ŞOREŞA AFIRANDINA HEZKIRINÊ YE



3



## Kobanî Sembola Rûmeta Mirovahi ye

16

## Xwe Parastin

19



## Gurzê Gelan

21



### YPJ STAR

Kovareke Leşkerî û mehane ye.  
Ji aliyê Navenda Ragihandina  
Yekîneyên Parastina JIN (YPJ)  
ve tê amade kirin. Di Çileyê  
2016'an de dest bi weşana xwe  
kiriye. Di asta Bakûr-Rojhilatê  
Sûri de tê weşandin.

Çile 2023  
Berga 85



### BERPIRSÊ WEŞANÊ

Meryem Seîd

### EDÎTOR

Zilan Taha  
Lena Hûseyîn

### LEKONÊRA LEŞKERÎ

Ranya Elî

### STRATEJÎSYÊN

Îlham Delal

### INDESÎNG

Merwa Faris


**W**ext angò zeman têgeheke wisa ye ku di nava xwe de hem çêbûnên êrînî hem jî yên neyînî dihewîne. Di nava civakê de mirovên herî alim û zanyar li ser wateya zeman gelek ponijîne. Mirovahiyê, gelek wate barî rojê kirin e. Ji ber yek jî pênaseya ku wext îfade dike jî hilhatin û çûna ava a rojê ye. Ev gûhertina periyodîk a ku tu astengiyan nas nasnake sî-nordar be jî têgeha wext re îfadeyeke peyda kiriye.

Di wateya rasteqîn de bûyerên ku di nava têgeha zeman tèn jiyîn an wê kêliyê pir bi wate û girîng dike, an jî bê wate û bê qiymet dike. Êdî qehremanên bûyerê di vê rewşê de roleke di-yarker dileyzin. Di sala 2022'an de cîhan bi gelek bûyerên bi êş re rû bi rû ma. Di vê salê de jî şer li gelek deverên cîhanê bê navber berdewam kir.

Ev şer bûn sedemên mirin, qeyran, birçîbûn û xirabûna derûniya civakî.. Yanî bi xwe re weke hertimî tenê xirab bûn anîn. Lê weke hemû serdeman daxwaza mafê jiyaneke wekhev û azad bi xwe re encamên pozîtîf derxiste holê. Sala 2022'an li Bakûr-Rojhilatê Sûrî, li hemberî hêzên dagirker bi berxwedaniyeke bê eman û tijî ve derbas bû. YPJ'ê bi tekoşîna xwe ya li hemberî desthildariyê di destpêka salê ji pêngava Gûrzê Gelan heta 8'ê Adarê, 4 Nîsanê roja Rojbûna Rêber Apo û salvegera damezirandina YPJ'ê, heta lidarxistina konferansa xwe ye 3'emîn di gelek waran de salekî têt û tijî derbas kir. Bi rihê roja yekemîn a avabûnê yekîneyên xwe, careke din parastina welat û gelê xwe kire nivînga jiyana û tekoşîna xwe. Bi giştî Jinên Bakûr-Rojhilatê Sûrî di sala 2022'an tekoşîneke bêeman dane meşandin, em jî weke YPJ'ê kovara xwe ye destpêka salê diyarî Kongra Star dikin.

Weke Kovara YPJ Star di nava vê salê de me hewl da em xwe bi mijarên cihêreng ve bighênin we. Di vê salê de jî emê hewl bidin bi formata nû a kovara xwe bibin deng û rengê wê. Mijarên ku me dest girtine wihane; nêrînên Rêber Apo cihekî taybet di kovara me de bigre, bîranên şer ên ku hevrêyên me jiyana û gelek mijarên ku lêkolînên taybet li ser hatine kirin, wê di kovara me de cihê xwe bigrin. Em hêvîdarin ku bi dilê we be.

Bi hêviyên jiyana azad a ku qet natemire, em sala we ye nû pîroz dikin.



## ŞOREŞA ME ŞOREŞA AFIRANDINA HEZKIRINÊ YE

*Împarator bi malbata xwe ve,  
bi hemû xanedan, jinên derûdora xwe  
ve, bi renekî ku weke kevirekî hişk  
bûye, di bin erdê de ye*

### Rêberê Konfederalîzma Demokratîk Abdullah Ocalan

Di roja me de pirsgirêka jin û malbatê yek ji mijarên herî girîng e. Mijareke ku li ser lîyîstok tîn kirin, di derbarê wê de gelekî tê axaftin. Mijareke ku di rîya wê de gelek tişt tîn kirin, di rastiya Kurdan de hinek kes di rêya wê de mêrkujiyê dikin, stranan li ser distrên û govendan li ser digerin. Di rastiya me de ev mijar ji dijmin hîna zêdetir xwedî bandoreke kujînê e. Beriya vê me ji bo pirsgirêka jin û malbatê zelaliyek danîbû holê. Lê belê em dixwazin vê yekê hîna zêdetir pêş bixin. Ew rastiyan weke ronahî û tarî, germ û sar, elektron û proton, erênî û neyênî ji bo xwezayê çî be, jin û zilam jî ji bo xwezayê xwedî heman wateyê ye.

Ango nêrbûn û mêbûn jî rastiyeke xwezayê ye. Lê belê ev anîna bîra xwe nîne, di derbarê rastiya xwezayê de zêde hewce nîne ku dazandî çêbibe. Em lê binêrin ev rastiya xwezayê ya gelekî şênber, gelo li gel me dikeve çî rewşê? Çewisandin di giştî de heyîn û rastiye, ji heyînê û rastîbûnê derdixe. Ger gihayek derbeyeke kevîr a gelekî hişk bixwe êdî ji gihabûnê derdikeve. Giha xweşik e, lê belê ji ber ku kevîr gelekî hişk e, wî gihayî dipêçiqîne û derbas dibe. Mirov dikare di xwezayê de bibe şahidê bûyer û pêşketinê wiha. Di civakê de jî, curên çewisandinê yên ku dişibine vê yekê hene. Ya ku pêwîste bijî, bi çewisandineke hişk ve dibe ku ji holê were rakirin. Rastiya gelê me jî hindekî vê rewşê dijî. Gelekî lewaz û ketibe vê rewşê sedema wê çî dibe bila bibe, tunebûna wê jî gengaz e. Masiyên mezin dikarin masiyên biçûk daqurtînin, mar dikarin gelek çivîkên xweşik bixine zikên xwe, tîmsah dikarin heyînên zindî bixin nava diranên xwe yên har û sosret û hema wisa daqurtînin. Piştî jî rondikên çavan birijînin. Ev jî rastiyan jiyanî ne. Di rastî de, di xwezayê de ev pênase nehatiye kirin. Di gerdûnê de zilambûn çiqasî derbas dibe, mêbûnî çiqasî derbas dibe? Li gor min ev pirsgirêk bi qasî rastiya mirov de heye tevlihev û bi nakokî nîne. Bi taybet pêwîste ne ji alî ve û ne jî ji dijber ve zêde encam nede. Ev pêşketinê di civakê de ku li ser zayenda jinê bi dijberî çêdibin, ji

ber taybetmendiyên wê mêbûna xwezayî zêdetir bi derbasbûna şaristaniyê û civaka çînî ve dest pê kiriyê. Di pêvajoyên çewisandin, neheqî û dagirkerî ku pêşketiyê de hêmanên mêbûnê weke dezawantajekê hatiye bikaranîn, bûye mijara çewisandin û dagirkeriyê. Ez di vê baweriyê de me ku ev dîtin rast e û zanistî ye. Ger ne bi vî rengî be, mêbûn bi serê xwe ne dagirkeriyê û ne jî hatina dagirkerinê, ne çewisandinê, ne jî çewisînê rave dike. Ev tişt bi rêxistinkirina civakî, ji wir jî bi pêşketina pergala çewisandin û dagirkerinê ve girêdan nirxandineke rast e. Pêşkêşkirina hindêk derfetan ku taybetmendiyên mêbûnê ji bo vê dike, di vir de diyarker nîne. Mirov nikare lewaziya fizîkî ya jinê jî weke sedemê diyarker derbixe pêş. Berovajî, dîrok jî ji bo vê yekê mînakên pêşkeş dike. Tê wê wateyê ku çewisandina li ser zayend û pêşketina pergalê çewisandin û dagirkeriyê ve girêdayî ye. Malbat jî rengê veguhertî yê civatên klan û kabîleyan e.

Weke veguhertinekê yan jî weke rengêkî civatê derdikeve pêşberî me. Malbat weke saziyê ji rengên civatên destpêkê heta roja me ku dixwaze xwe bide jiyîn, ketiyê nava vî karî. Bi hatina gelhev a cureyên mirovan ve rê vekiriyê ku xwezazkirineke ku jê re tê gotin, malbat ava bibe. Di şeweyên destpêkê yên civatan de, di navbera malbat, klan û qebîleyan de zêde cihêbûn nîne. Ev yek hema weke hev in. Di nava her

civakê de cihêbûna wê û hatina wê ya asteke ku bibe saziyêkê cihê, bi pêşketina civaka çînî ve hîna zêdetir gengaz bûye, taybetmendiyên xwemalî bi dest xistine. Em dikarin vê yekê jî bînin ziman, malbat bi şeweyên xwe yên dîrokî yên ku heyî ve bi pêşketina şaristaniyê yan jî bi gotineke din ve, di nava pêvajoya pêşketina pergala çewisandin û dagirkeriyê de bû saziyêke ku her çû xwe taybet kir. Dema pergala koledar derkete holê, xwediyê koleyan malbatên balkêş derxistin holê. Bi rastî jî hindêk eserên gelekî balkêş ên pêvajoya koledariyê hene. Ew tîrbên malbatên mezin di serdema koledariyê de di dewletên koledar de derketine holê. Tîrbê malbateke wê demê ji mabetên bi nav û deng ên vê gavê hîna zêdetir xwedî nirx in. An jî ji salona konserê, ji cihekî seyranê hîna balkêştir e. Ji van tirban ev derdikeve holê: li gel xwediyê koleyan de malbat bûyereke gelekî mezin e. Ji bo çî ev yek wisa ye? Xaleke bingehîn a çewisandin û dagirkeriyê malbat e. Xwediyên koleyan ku cara yekem dewletbûna mezin bi dest xistine bi rewşeke jorçivakî ve ber bi xwedabûnê ve diçin. Malbat jî şeweyeke ku herî zêde ber bi çav dibe. Di heman demê de mirovan xwestiyê ku bêmiriniyê bijîn. Di tîrbê firavûnên Misirî de hîna jî mumyayên wan hene. Împarator bi malbata xwe ve, bi hemû xanedan, jinên derûdora xwe ve, bi rengêkî ku weke kevîreke hişk bûye, di bin erdê de ye.

Li gel ku li pey bêmiriniyê de



**Dema pergala koledar derkete holê, xwediyê koleyan malbatên balkêş derxistin holê. Bi rastî jî hindêk eserên gelekî balkêş ên pêvajoya koledariyê hene**



ye, xwe bi rengêkî li jor xweza û civakê dike xweda û bi rengî hetanî roja me rengê xwe dide. Ji bo mîmariyê jî bi vî rengî nêzik dibin, lê belê malbatên koleyan nînin. Mafên wan ên avakirina malbatê jî nîne. Ew jî rastiyeke e. Weke tê zanîn, di pêvajoya feodaliyê de xanedanî hîna zêdetir hate pêşxistin. Di rastiyeke de xanedaniyê mezin, aîdê serdema feodaliyê ne. Ew xanedaniyên Emewî, Ebasî, Selçuqî û Osmanî yên di Îslamiyetê de her yek ji wan weke dewletên malbatî yên balkêş in. Rêncberên (serf) di vê serdemê de jî, hêdî hêdî mafên xwe yên

avakirina malbatê bi dest dixin. Avakirina malbatê aîdê serdema rênçberiyê ye. Avakirina malbatê yên çînên jêr û pêşketina malbatgeriyê bi serûberbûna feodalî û derbaskirina koledariyê ve gengaz dibe. Dema ku kapîtalîzm weke pergala bi pêşket, vê carê jî malbatên bûrjuva bi hemû balkêşbûna xwe ve derketine rastê. Li Ewrûpayê hîna jî bandorên van gelekî zindî ne. Li Fransa, Îtalya û Almanya hîna jî malbatên bûrjuva yên gelekî bihêz hene. Di vê mijarê de Îngîlistan jî di heman rewşê de ye. Di pergala kapîtalîst de di nava jêr, di nava proleterya de hindêkî din jî pêşket. Girêdaniya vê yekê bi dagirkeriyê ve gelekî zelal e. Ji ber dagirkeriyê malbat bi pêş nakeve. Di koleyan de, rênçberan de û proleterya de rewş bi vî rengî ye. Lê belê di çînê dagirker û zordest de jî malbat gelekî balkêş bi

pêş dikeve. Gelo emê pênaseya malbatê çawa bikin? Di nava saziyeke ku evqasî bi dagirkeriyê û dagirbûnê, çewisandinê û çewisînê ve girêdayî ye, çi nabe û çi lêyîstok nazîvirin. Saziyeke bi vî rengî pêwîste herî zêde were lêkolînkirin. Di rastiye de di vê mijarê de lêkolîn hîna nû têne kirin. Tê xwêstin naveroka malbatê, hîmê felsefîk ku xwe dispêre pirsgirêkên ku afirandine vê gavê were dîtîn. Bi taybet zêdebûna nifûsê ya balkêş jî mijara gotinê ye. Tê gotin ev zêdebûna nifûsê mirovatiyê û cihanê tehdît dike. Girêdana vê yekê bi malbatê re heye. Pirsgirêkên malbatê ku di pergala emperyalîst de him gelên tên çewisandin û girêdayîne him jî welatên kapîtalîst emperyalîst de derdikevine holê. Mirovati hereşe (tehdît) dikin. Ger tedbîr neyên girtin mirov nikarin di cihanê de bijîn. Bi rengê ku hati-

ye pejirandin malbat û weke ku saziyeke bingehîn e, ku mirovahiye li aliyekî dihêle ber bi dawî anîna mirovatiyê ve diçe. Ji ber vê yekê jî malbat û şewazên têkiliyan ên ku yekser bi malbatê ve girêdayî ne, dê werin lêkolînkirin, werin nirxandin û riyeye çareseriyê were dîtîn. Ji lewra ew serûberkirina têkiliyan di navbera her du zayendan de li ser mirovahiye dibe hereşe. Têkiliya di navbera her du zayendan de ku di nava gelên li Efrîka, Emerîkaya Latîn û di Rojhilat a Navîn de dijîn de jêdereke qeyranê ye. Malbat bi tenê ne zêdebûna nifûsê de di afirandina pirsgirêkên weke bêperwerdetî, bêkarî û qeyrana derûnî de jî bûye saziyeke rûxandinê. Li gel vê yekê jî li welatên kapîtalîst ên pêşketî de tê dîtîn ku ber bi encamên hîna xetertir ve çûyîn çêdibe. Şewaza têkiliya zayendî, bi taybetî sere-

**Avakirina malbatê aîdê serdema rênçberiyê ye.**

**Avakirina malbatê yên çînên jêr û pêşketina malbatgeriyê bi serûberbûna feodalî û derbaskirina koledariyê ve gengaz dibe**

**Jiyan di çarçoveya ku di sînorên tên pejirandin de û aliyê wê yê azadiyê hîn pêş ve diçe û ber-dewam dike. Di bin ronahiya nirxandinên ku giştî hatine kirin de em li rastiya xwe binêrin**

rastkirin û serûberkirina wê welatên kapîtalîst ber bi îflasê ve dibin. Ew rêpîvanên ku hatine danîn, bi navê exlaq, bêexlaqiyê derdixe asta herî bilind. Cihêkî weke Efrîqa ku bandora pergala klanên lê peyda ye, têkîliya zayendî di rewşeke nexweşiyê de ye. Ajoyên zayendî hiştiye ku mirov nikarin ji nav derbikevin. Ev tişt gelekî zelal e. Pêwîste di giştî de malbat û şewazên têkîliyan di navbera zayendan de, bi taybetî jî saziya malbatê bi lez were lêpîrsînkirin û ger gengaz be ji nû ve were avakirin. Bi rengê gelekî balkêş, lêpîrsîna van têkîliyan tê kirin û tê xwestin yê nû were pêşxistin. Lê belê hîna jî çareserî nehatiye dîtin. Olan xwestin ku şeweyekî diyar bi cih binin. Dîsa şewazên civakî, aborî xwestin li gor xwe mînak zagonên exlaq bi pêş bixînin. Lê belê hemû jî kêr dimînin. Gelo nêzîkbûnê felsefîk ên nû û bingeheên exlaq heta nêzîkbûnê nû di derbarê vê pîrsgirêkê de çawa bibe? Li gel pêşketina zanistiyê di vê mijarê de de çi were gotin? Pêwîst e mirov bi baldarî binirxîne û lêkolîn bike. Ji lewra ev pîrsgirêk bi hemû pîrsgirêkên civakî ve ji nêz ve girêdayî ye. Di civakê de ji bo pîrsgirêkên vê saziyê ku weke saziyeke bingeheîn tê bi bîranîn gelo de çiqasî girêdayî zanistiyê çareseriyek were dîtin. Ev pîrsgirêk de çiqasî ji bo zanistiyê werin nîşandan? Di vê mijarê de zêde pêwîstî bi ponijandina kûr û felsefekirinê nîne. Ev, arîşeyeke (problem) çi qasî cidî ye, li hemberî mirovahiyê sekiniye ev rastî gelekî eşkere ye û zelal e.

Dibe ku zanistî ber bi çareseriyekê ve biçê, dibe felsefê û exlaq hindêk tiştan bi pêş bixin, li ser vê bingeheê teqezê de ji bo şeweyên têkîliyan çareserî were dîtin, de şeweyên nû yên têkîliyan derbikevin rastê. Jiyan di çarçoveya ku di sînorên tîr peji-randin de û aliyê wê yê azadiyê hîn pêş ve diçe û berdewam dike. Di bin ronahiya nîrxandinê ku giştî hatine kirine de em li rastiya xwe binêrin. Rastiya gelekî ku tîk çûye bandor û encamên xwe yên rûxîner di nava saziya malbat ku weke saziyeke li ser piyan maye de xwe nîşan dide. Weke ew kesên ku dibêjin di dest me de tenê malbat maye gelo bi rastî jî li ser piyan maye? Piştî ku rastiya netewî hate perçiqandin hemû pergaleên sazî û tîkîliyên civakî tîk çûn dil hatine girtin û hatine hilweşandin, rûbirûyê dagirkeriyê û çewisandinê hatin bi bişaftinê (asîmîlasyon) hatin tasfîye kirin, ji bo wê malbata ku di dest de maye mirov dikare çi bibêje? Hela ji bo malbatekê her tişt dayîna pêş çavên xwe tîk çû wateyê? Derveyî malbatê tu armanc nedîtin tîk çû wateyê? Gotina “her tişt ji bo malbatgeriyê” tîk çû wateyê. Pîrsên bingeheîn ku pêwîste bigihên zelaliyekê ev e. Li gor me, karesata rast hebûna rastiyeke me ya malbatê bi vî rengî ye. Ji ber ku bi tevî rewşeke her tişt hatiye wendakirin de bi rengê “sparteka min a dawiyê” an jî “hemû hebûna min” hembêz-kirina malbatê ji rê derketineke mezin e. Xerîbûna ji cewher e, xilasbûn e, xwe derveyî rastiyeê hiştine û apolîtîk kirine.

Dijberî netewbûnê ye. Heta malbatên li gel me kesan li hemberî saziyên din ên civakê nezan û bêkar dihêle. Rewşeke bi vî rengî diafrîne. Ew kesê ku di nava rastiya malbata me de mezin dibin jî em in. Tê wê wateyê di hindêk welatên din de nîrxê girtîbûna malbatê yek be li gel me bi qasî hezarî ye. Hele ev bi taybetmendiyên serdema qebîleyên hov û bi rêbazê şerê taybet ê dijmin ve gihiştibe hev û pêşkêşî me hatibe kirin, tîk wê wateyê ku em rûbirûyê karesatekê rastî ne. Yekî ku nû ji dayik dibe hîna nû çavên xwe vedike ewlehiya xwe di nava malbatê de dibîne. Hinekî mezin dibe yan jî nabe ewlehiya xwe di malbat avakirinê de digere. Di nava malbatê de her kes dibêje “em hewcedarê hev in, pêwîste bi her tiştê xwe ve em vê saziyê bidin jiyîn.” Ên ciwan jî, yên temen mezin jî vî tiştî dibêjin. Pêşxistina rastiyan weke netew, civak, sazî û dezgehên din ne di bîra tu kesekî de ne, van tiştan jî gelekî ne pêwîst dibînin.



# XORREM

## Mîlan Zerdeşt

**K**etin, veger, naskirin û fêmkirina dîrokê wê îro û sibê ji me re zelal bike, divê em tenê yê di şer û pevçûnan de bi serketine nas nekirinê re sînardar nemînin. Ji ber ne tenê wana dîrok jiyane ji bo em hemû bûyeran rast nas bikin emê di civakê de lêgerînên xwe bikin. Dîroka bi destê serdestan hatiye nivîsandinê tê de têkoşîna civakan û jinan tune ye. Ji ber vê em roja îro tenê dîroka nivîskî ji xwe re nakin çavkanî. Divê mêzekerînen me ne yekalî bin, dema em her di nava lêkolînan de bin, dibe ku hin tişt wek xwe

nemînin bi wateya ku dibe bi demê re hin rastiyan din derkevin holê. Jin rastiyeke ku di dîrokê cih girtiye, ne tenê cih girtiye jî olên herî mezin jî listiye. Serdest pêşketinê ku bi destê jinan çêbûne ji nedîtî ve tînen û her tiştê ku bi jinan ve têkildare ji aliyê zîlam ve tê înkâr kirin û li gorî wan ne tişteke ku pîroze ku bê dîtin e. Di encama hin lêkolînan diyar dibe ku ji bo berdewamkirina mîrasa dayîkên xwedawend gelek jin derketine, rabûne û têkoşiyane û bi xwe re civak jî rakirine .

Di salên 400'î P.Z li ser xakê rojhilatê Kurdistanê çîroka Xorrema serhildêr hatiye jiyana kirin. Navê dayîka wê Dayezer e û navê bavê wê jî Qade ye, Xorrem çavên xwe di gund li jiyane vedike û heya demekê baş jî jiyana xwe tede derbas dike. Di gund de Xorrem fêrî pîvanên exlaq, çand û azadiyê dibe ji ber vê xwedî taybetmendiyên baş û exlaqeke bilind e, piştî ku Xorrem êdî dikare tiştan ji hev derbixe wek; başî-xerabiyê, ronî-tarîtiyê û azadî-koletiyê.

Di wan salan de desthilatdarî di destê Sasaniyan daye, dema tê gotin desthilatdarî gotina demokrasî jî holê radibe kole û serdest çêdibin. Lê çiqas desthilatdarî û serdest xwe di jiyane û li ser civakê ferz bikin jî; çanda wekhevî û demokrasiyê di dil û mejiyê hin mirovan de hîn maye. Xorrem yek ji wan



mirovên ku çanda dayîka xwedawend ji bîr nekiriye û paras-tiye, Xorrem rewşa kolebûyîna civakê bi ti awayan qebûl nake û dibihîse yên ku mafê civakê tînin ser ziman û dixin rojevê ji aliyê serdestên Sasaniyan ve tînin ceza kirin û kuştin dibe para wan. Ev tişt dudiliyê bi Xorremê re nade jiyîn berovajî wê her nîqaşên ku mirovan re dide meşandin, dixwaze ku şiyarbûnek di nava civakê de bê çêkirin û êdî ji bo Xorrem mijara azadî dibe mijarek herî girîng.

Ne tenê Xorrem dibe dilxwaza azadî û wekhevîyê di wê demê de Mazdek jî xwedî fikrên demokrat û wekhev bûye, di dîrokê de piştî Zerdeşt û Babek derketina Mazdek tê naskirin, Xorrem û Mazdek rastî hev tînin di encama nîqaşan de biryara têkoşîna bi hev re didin û bi hev re dizewicin lê eger em zewaca wan wek zewacek normal bigrine dest wê ne di derheqê Xorrem de û ne jî di derheqê Mazdek de emê binin xwedî nêrîneke rast. Ji ber di tîkiliya wan de pîvanên azadiyê, wekhevîyê û rêhevaltiya dozê li pêş e, her duyan biryara têkoşîn kirina li hember desthilata Sasaniyan dabûn û azadiya civakê bû armanceke wan a mezin û pîroz. Gava yekem weke biryara destpêkirina di nav civakê de fikra demokrasiyê û azadiyê belav kirinê, didin. Xorrem di gundan de dest pêdike û wek mamosteya azadiyê rola xwe dileyze, li ser hîmên mirovahiyê û çanda demokrasiyê civakê perwerde dike. Herî


zêde jî dixwaze ku jinan birêxistin bike û wan zana bike Xorrem her ji wan re digot “Eger zanebûna te hebe tuyê ji jehrê jî sûdê bigrî, lê eger zanebûna te tune be tuyê ji hungiv jî zeraê bibîne.” Di nava gel de gelek dihate hezkirin ji ber rêzdarî, hezkirin û sekna wê ya xurt di nava gel de, her ku diçû baweriya Xorremê xurt dibû û hêviyên wê mezintir dibû. Xorrem xwedî zanist, zanebûn jêhatîbûn û tîgîhiştî bû, ev tişt jî hiştibû ku jêre bê gotin ku Xorrem Hypatyaya civakê ye û Hypatyaya jî Xorrema zanistê ye. Xorrem ne tenê dixwast ku li hember desthilatdariyê bisekinê dixwast ku sira jiyane jî nas bike, ji bo jiyane rast bijî û bide jiyane kirin. Êdî civak rastiya desthilatdariyê nas dikin, ev tişt jî serdestan dixwe nava xeteriyê de. Xorrem baweriya wê hebû ku eger hêza civakê bê birêxistin kirin wê desthilatdarî nikariye pêşîya civakê bigirin.

Desthilatên Sasaniyan êdî bi navê Xorrem û Mazdek bihîstibûn û bihîstibûn ku civakê perwerde dikin ji ber vê ketin hewildanên ku pêşîya wan bigrin, ji bo pêşîya serhildana gel bê girtin dixwastin pêşengên sehildanê tasfiye bikin. Bi fêlbaziyekê şahê Sasaniyan, Mazdek dawetî gel xwe dike; Mazdek bi yazdeh hevalên xwe re diçin lê li wêderê bi rengê hovanê wan dikujin. Gel jî ber kûştina Mazdek nerazîbûnên xwe li hember serdestan didin nîşandan, lê gelê sehildêr rastî komkujiyan tînin.

Dema ku Xorrem vê bûyerê

dibihîse xemgîniyek mezin jiyane dike Xorrem fikrî ku ronîkirina civakê wê bibe tolhildana herî mezin. Ji ber vê jî ji biryara belavkiriina fikrê xwe gav paşde neavêt.

Xorrem bi navê Dayîka Raperîne tê naskirin ji ber piştê serdema xwedawendan jina yekem serî rakirî Xorrem e. Heya dawîya jiyana xwe jî her di nava têkoşînê de bû û kesên ku li ser fikrên Xorremê mane wek Xorremî an jî Xorremdîn tînin binav kirin, Xorrem gelek şopên pîroz yê ramanên azad li pey xwe ji civakê re hêlîşt û bi taybet ji jinan re. Gelek bi wate û pîroze ku Xorrem di dil û mêjiyê civakan de wek sembola serhildanê heta roja me ye îro hatiye.



## BERIYA SERÎHILDANA NETEWÎ YA 1925'AN AMADE- HIYÊ KOMÎTEYA AZADIYÊ

Ger meriv bûyerek dîrokî bikole, dixwaze lêkolînan be an jî kesek ji rêzê be, pir hindik di bin bandora rewşa siyasî ya roja xwe, cihê di civakê de digre û di bin kesayeta xwe de dimîne. Ji bo van bandorên neyînî lêkolîna ku herî mînimîze bê kirin, divê xwe ji nîrxê civaka xwe xilas bike. Her çendî di bûyerek dîrokî de li ser "rastiyek" li hev kirin ne pêkanbe jî, bûyer li gorê metodolojiya dîrokê bê nîrxandin û xwe gihandina

rastiyê armanc be, bûyer baştir tê fêmkirin. Em nikarin gorê "zanîna xweza" yê nêzê dîrokê bibin, ji ber ku bûyerek dîrokî tu car dûbare nabe, bi heman awayê naqewime. Bûyera dîrokî di hindirê xwe de xwemal e. Ji xwe metodolojî ya dîrokê nêrîna pozîtîvîst ku bi awayeke domdar dinêre red dike û divê hewceye

ku meriv li bûyerek dîrokî di rêbaza wî a xweser de binîrxîne, dipejirîne. Meriv ji viya re dikare bêje "nêhêrîna dîrokî."

Di bûyereke dîrokî de, "navkirin" pir hindik derbarê bûyerê de agahî dide meriv. Mînak ku yek behsa "şerê birakûjî" yê bike ku derbarê bûyerê de agahî yê wî tunebe jî pir hindik fêma bike ku şerek di nav biraya de bûye, an jî ku yek bibêje "şoreşa îslamî ya îranê" meriv fam dike ku şoreşek îslamî ye, kesên îslamî li îranê bûne serdest. Li serhildana 1925'an jî dikare bi vî çavê bê nêrîn. Li serhildanê navkirina "Serhildana Şêx Seîd" pir tiştan berewajî dike, pir tiştan vedîşêre û pir tiştan radixe ber çav. Ji ber ku ev nav ji alî serdestan an jî serkeftiyên hatî dayîn. Ji xwe piri bûyerên dîrokî de, navkirina bûyerê dibe para serdestan. Ev di taybetiya Kurdan de du qat zêdetir e. Ji ber ku tu sazîkî dewletî ku dîroka xwe bide fêrkirin tune û piraniya Kurdan di dezgeyê dewleta Tirk de dîrokê hîn dibin.

Mehmet Bayrak di pirtûka xwe ya bi navê Pirsgirêka Kurd û çareserîya demokratîk de dibê ku: "Bi rastî hûn qet fikirîn? Çima nêrîna fermî, ji serhildana Koçgirî re dibêje serhildana Alişêr an jî tevgera Dêrsimê re dibêje tevgera Seyît Riza, ji serhildana netewî a 1925'an re dibê serhildana Şêx Seîd?" Meriv bi hûrgulî bifikire bi rehetî armanca serdestan fêma dike. Ji xwe dema serhildan didomiya, di 30'ê Nisan'a 1925'an de Seroktiya Sererkanê Giştî ji desteya wezaretê ra hişyariyek şand û xwast ku serhildan di çapameniya hindir û derve de wek tevgerê

**Vê serhildanê wek  
tevgerek oldar,  
korbawer û  
paşverû bê  
nîşandayîn, ji ber  
ku wek  
serhildanek  
netewî bê  
nîşandayîn  
ji berjewendiyên  
dewletê re çep e**

oldar, korbawer û paşverû bê nîşandayîn, ji ber ku wek serhildanek netewî bê nîşandayîn ji berjewendiyên dewletê re çep e. Li ser vî hişyariyê desteya wezaretê di civîna xwe 3'ê Gulana 1925'an de, li gor daxwaza Seroktiya Sererkanê giştî biryar girt û wezaretê derve erkdar kir. Armanca van biryaran ew bû ku pêşî li alîkariya dewletên ewrûpayê ya ji bo serhildanan girtin bû. Lê di heman demê de di hindir de jî bo pêşiya oldarên Tirk bigrin tevgerê wek serhildanek netewî dan xuyakirin. Bi kurtasî ku meriv bixwaze serhildana 1925'an fam bike divê pêşî ji "navê serhildanê" dest pê bike!

Vekê ku tê zanîn tu serhildanek bê amadehî nayê kirin. Serhildana 1925'an jî bi vî awayê ye. Beriya ku serhildan dest pê bike xebatên cûrbicûr hat kirin. Van xebatan Komîteya Azadiya Kurdistanê ango bi navê xwe yê tê zanîn Azadî kir. Çawa ku rêxistina Xoybûnê (xwebûn) nebûya serhildana Agirî jî yê nedibû, bi heman awayê rêxistina Azadiyê jî nebûya serhildana 1925'an nedibû. Ger bibûya jî meriv dikar bibêje bi heman awayê nedibû. Ji bo ku serhildana 1925'an baş bê famkirin dibê xebatên beriya serhildanê bê zanîn.

Martin Van Bruinessen derbarê Azadiyê de: "Li Tirkiyê rêxistina azadî di 1923'an de hat damezrandin. Ew rêxistin li gor rêxistinên din cûda bû. Piranî endamê rêxistinê leşkerên pisporbûn. Navenda wê wek rêxistinê din ne li Stenbolê li Erziromê bû."

Robert Olson pirtûka xwe ya bi navê, Çavkaniyên netewperweriya Kurd û serhildana Şêx Seîd de dibê: "Azadî ne li bajarek beyanî ne Stenbolê di 1921'an de li Erziromê dest bi xebatê xwe kir." Olson di heman pirtûka xwe de rêxistina Azadî yê yekem rêxistina Kurd a netewperest dibîne.

Garo Sasuni bo damizarindina Azadiyê wiha dibê: "Kurd fam kirin xetereya Tirk berê xwe daye wan di tiştrîna 1920'an de di bin serokatiya Xelilê Cibrî, mebûsê Bilîsê Yusuf Ziza, Kemal Fevzî û Şêx Seîd de rêxisti-

nek damizirandin. Ev rêxistin di nava netewa Kurd de kok berda û di nav çend mehan de hemû Kurdistanê bi şaxê xwe pêça." Wekê ku di vê nivîsa Sasonî jî tê famkirin rêxistina Azadî bi teqez ne diyarbe jî bi texmînî di navbera 1920-1921'an de hatî demizirandin. Lê rêxistin piştî salên 1923'yan ango piştê damizirandina komara Tirkîyê xebatên xwe yê cidî dest pê kir.

Xebatên Azadiyê bi dizî bû. Li piranî bajarê Bakûrê Kurdistanê şaxê xwe vekiribû û bi navgîniya van şaxan dixebitî. Endamê şaxa Diyarbekirê Zinar Silopi di pirtûka xwe ya bi navê Doza Kurdistan'e de diyar dike ku navenda Azadiyê li Erziromê bûye. Rêxistin bi telgirafên şifreyî pêwendî şaxan re datanî. Her çiqas rêxistin bi dizî bû jî, dûre derket holê ku haya dewleta Tirk ji xebat û tevgerên Azadiyê hebûye.

**Dewleta Tirk piştî qanih bû ku serîhildan dest pê dike hewl da ku serîhildanê pêşve bixe. Ji ber ku hêzên Kurd roj bi roj li Kurdistanê firehtir dibûn.**

jî bû sedem ku gelê Botanê di serîhildana 1925'an de nikaribin piştgiri bidin serîhildêrên Kurd. Bê vê jî bi lez dest bi girtina qadroyê Azadiyê kirin di encama van tevgerê wan de Yusuf Ziya paşa hat desteserkirin. Ji wir jî lêpîrsîn dirêjê serokê Azadiyê Mîralayî Xelîlê Cibrî bû. Ji ber van girtinan tevger bê serî ma û hêzên Kurd ketin nav panîkê. Dewleta Tirk piştî qanih bû ku serîhildan dest pê bike hewl da ku serîhildanê pêşve bixe. Ji ber ku hêzên Kurd roj bi roj li Kurdistanê firehtir dibûn. Serokê Azadiyê Xelîlê Cibrî -ku di girtîgeha Bilîsê de bû- bo van planên dewletê pûç bike, ji Şêx Seîd re bi dizî peyama şand ku "ecele nekin û xebatên xwe leztir bikin." Piştî Şêx Seîd serkêşiyê girt destê xwe, provakasyonek dewleta kemalîst jî kuştina birayê Şêx Seîd Şex Bahaddîn bû. Hê ku serîhildan dest pê nekiribû Şex Bahaddîn li Xînusê tê kuştin dewlet bi vî armanç dikir ku serîhildan zû dest pê bike.

Di vê pêvajoyê de xala herî girîng serîhildana Beytûşebabê ye ku di şeva 3-4'ê Îlona 1924'an de pêk hatiye. Serîhildana Beytûşebabê derbarê Azadiyê de agahiyên girîng dide me. Di serî de diyar dibe ku Azadi serîhildanek pîlan kiriye, her çiqas bê gotin ku şaş famkirina telgirafê re serhildan dest pê kiriye jî lê ev nayê wê wateyê ku serîhildaneke nehatî plankirin e. Ya duyemîn wekê ku Bruinessen jî dibêje rêxistin di nav leşkeran de bi rêxistinî bibû ji ber ku serîhildana Beytûşebabê bi tevahiya peyayê alaya 18. ku girêdayê liqa 18. parartêşa 7. bû bi tevê çekên xwe yê giran û sivik serî rakirin, lê piştê ku serîhildan têkçû derbasê Iraqê bûn ku di bin mêtîngeriya îngîlistanê de bû.

Piştê vî raperînê dewleta Tirk a kemalîst fêhm kir ku tevgerew bi rêxistinkirî li hember wan e. Ji ber wê xebatê xwe cidîtir kir. Bi hezaran leşker kişande navbera "sînorê" Iraq û Tirkîyê him bi vê peyamek da îngîlistanê - ku di wî navberê de doza Musilê berdewam dikir- him jî zordestiya xwe li ser gelê Kurd ê Botanê zêdetir kir. Ev

Di nav van xireciran de bi provakasyonek dewleta Tirk di dîroka 8 sibata 1925 de serîhildana netewî ya 1925'an de bi serleşkeriya Şêx Seîd dest pê kir.

# Şoreşa Jinê û



J  
i  
n  
e  
o  
l  
o  
j  
î

Zozan Sîma

Civakbûyîn her tim di nav guhertin û vegurtinekê de ye. Lê hin guhertin hene kû em ji wan re dibejîn şoreş. Lê wateya rast a şoreşê çi ye? Kijan guhertin weke şoreşên civakî tînin binavkirin? Di dirokê de şoreşa yekemin ya civakî şoreşa ziman e. Li gorî çavkaniyên dirokî, ev şoreş 50.000 sal berî zayîne hatîye jiyîn.

Bi vê şoreşa ziman, çand û civakbûyînê re, di demeke pir kin de pêşketinê gelek mezin derketine holê. Li gorî vê yekê em dikarin bêjin ku guhertinê mezin ên di demeke kin de rû dane,

şoreş in. Gûhertinên ku li ser pêşketina civakê erênî bandor dikin, weke şoreş tînin binavkirin. Şoreşa duyemîn a mirovahiyê jî ya çandî û avakirina gundan e.

Gordon Childe ji vê şoreşê re dibêje, şoreşeke zanistî û teknîk. Ev jî şoreşa neolîtîk e. Ji ber şoreşa neolîtîk bi pêşengiya jinê çêbûye, Reber Apo dibêje ku ev şoreşa jinê ya yekemîn e. Ji ber ku jiyana civakî li ser xwezaya jinê hatîye avakirin. Di aborî, siyaset û tekiliyên civakî de rola jinê diyarker e.

Lê belê di dirokê de gelek caran guhertinê li dijî civakê jî çêbûne. Em ji van re dibejîn şoreşên dijber. Di salên 3500 yên Berî Zayîne de, pêşxistina pergala bavixsalarî yek ji mînakên wê ye. Dewlet, çîn, koledarî û dagirkerî piştî wê pergale derketiye holê. Di sedsala dawî de jî, Weke Teverga Jinên Kurdistanê ev demeke dirêj e em qala şoreşa jinê ya duyemîn dikin. Şoreşa Rojava weke şoreşa jinê tê penase kirin. Lê dema em dibêjin “şoreşa jinê” çi tê fêmkirin?

Reber Apo jî bersîva vê pirsê weha dide:

Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye ‘şoreşeke jinê ye’ ya ku wê li tevahiya qadên civakî were meşandin. Çawa ku koletiya jinê koletiya herî kûr e, divê şoreşa jinê jî bibe şoreşa herî kûr a wekhevî û azadiyê. Şoreşa jinê divê hem di teorî û hem jî di çalakiyê de gavên bi kok biavêje.

Di dîrokê de gelek şoreş çebûne. Şorêşen felsefî, olî, çandî, çînî, yên gelên bindest hwd. Di nav van şoreşan de gelek jin jî cihê xwe girtine. Lê dema em dibêjin “şoreşa jinê”, wateya wê, tenê cihgirtina jinan a di şoreşê de nîne.

Ji ber ku di dîrokê de berî niha jî di gelek şoreşan da jinan cihê xwe girtin. Lê dema ku şoreş pêk hat, ji jinan re hate gotin ku dîsa vegerin malên xwe û tevî ked û hewldanên wan, di statûya jinê ya civakê de ti guhertin çênebû. Yek ji sedema bingehîn a rêxistinbûna xweser ya tevgerên jin jî ev bû. Tekoşîna jinan a ji bo wekhevî, azadiyê ev nezîkî 300 sal e xweser tê meşandin.

Li hemû dinyayê bandoreke mezin çekiriye û ji bo jinan gelek destkeftî afirandiyê. Lê hin jî em nikarin van pêşketinana weke şoreşa jinê bi nav bikin.

Ji bo ku têkoşîna jina Kurd bi vî rengî encam nebe, Reber Apo

hîn di salên 90’î de destnîşankir ku divê Şoreşa Kurdistanê weke şoreşeke civakî û şoreşa jinê pêk were.

Ji ber vê yekê dema em li dîrokê dinêrin, dibînin ku tekoşîna azadiya Kurdistanê di çarçoveya azadiya jinê de pêşketinên gelekî mezin afirandine. Bi şoreşa Rojava re ev gihast asta herî bilind û li cihanê deng veda. Rêxistinbûna jinê ya di qada leşkerî, sîyasî, civakî û sazîbûyîna de û pergala hevserokatiyê di encama van pêşketinên de derket holê.

Lê ev pêşketinên ku heta niha bi têkoşîna jinê hatine afirandin, ma têr dikin? Ango li gorî van gavên hatine avêtin, ma em dikarin bejin ku me şoreşa jinê çêkiriye? Bersivê vê pirsê girîngin. Ji ber ku nerîna me de şoreş pevajo yeke û her daîm dewam dike. Nirxên azadî çiqas din av civakê de cih dibin, dibin çand û axlaq vê demê şoreş evqas mayînde dibe.

Şoreşa jinê di heman demê de şoreşa civakê jî ava dike. Li Rojava jî şoreşa jinê di çanda civakê û di warê azadiyê de guhertinên bingehîn ava kirine. Ji ber vê yekê şoreşa jinê di heman demê de şoreşa civakê ye. Azadiyê jinê di nav civakê de weke çand û exlaqê bi cih bûye.

Rêber Apo armanca şoreşa jinê li gorî van xalên sereke pênase dike:

- Li dijî îdeolojiya cinsiyetparêz şerekî dewamî û dijber,

- Li dijî têngiştina tecawizkar a bîstûçar saetên rojê li ser karê, di warê exlaqî û politîk

de jî şer were xurtkirin.

- Divê diyardeya zarokanîna ya bi armanca mêtinkarî û desthilatdariyê were mehkûmkirin û redkirin. Îradeya zarokanîna bi temamî ji jina azadbûyî re were hiştin.

- Divê di îdeolojiya xanedantî û malbatê de şoreş pêk bê.

- Divê mirov ji felsefeya heyî ya jiyana bi jinê re, belkî jî ya ji vê rastir, ji vê bêfelsefetiye bibihure.

Ji bo bihêzkirin û mîsogerkirina şoreşa jinê, berpirsariyeke mezin dikeve ser milê Jineolojiyê jî. Ji ber ku her şoreş piştî xwe dide zanistêke civakî. Jineolojî jî xwe weke zanista şoreşa jinê penase dike.

Kar û barên kû Jineolojî dimeşîne ji bo şoreşa jinê bingehêke zanistî dide avakirin. Ji bo vê jineolojî mijarên xwe ye lekolînê li gorî pêwîstiyên şoreşa jinê diyar dike.

Bi lekolînên civakî pirsgirek û pêşketinên civakî tahlil dike û encamên vê civakê re parve dike. Heman demê sazî û kesên kû ji bo şoreşê kar dikin re proje û lekolînên hewpar çedike. Saziyên jin û bi giştî kesên kû ji bo şoreşê kar dikin li van lekolînan sîd verdirin. Armanca lekolînan çareserkirina pirsgirekan, bihêz kirina civakê û derxistina heqîqete esase.



# Jineoloji

# ŞERÊ HEBÛN Û AZADIYÊ



## Nûhat Koçer

Di pêngava Til Hemîs a yekemîn de em weke şervanên azadiyê ji bo ku bi hevreyên xwe yên di çeperên şer de bibin alikar me yekser berê xwe da bajarokê Til Hemîs ê. Beriya em derbasî cem hevreyên xwe bibin em li gundê Xernobiyê sê çar rojan man. Wexta me xwe bi cih kir yekser me gergerok û zîrevan ji bo ewlehiya qampê û hevrêyên xwe derxistin. Di gundên derdora me de çeteyên DAIŞ'ê hebun. Li pêşberî me jî bajarokê Til Hemîs ê hebu. Pêvajoya ku me cihê xwe di gundê Xerboniyê de digirt hemu bala me tenê li ser dijminê me bu. Da ku em bikaribin parastina axa xwe bikin. Piştî mayîna

me ya çend rojan li wir şunda, em yekser derbasî qampa gaziyê bun. Da ku em li wir amadekariyên xwe yên pêngava duyemîn bikin.

Bi destpêkirina pêngava duyemîn a Til Hemîs ku di gundewarên bi navê Xizîla û Ewêşa de destpêkir û her ku diçû em pêşde diçûn, min jî weke şervaneke YPJ'ê cihê xwe tê de girt. Me weke qûwetê Til Koçer û qûwetê Dêrîk'ê ji Til Koçer destpêkir gund bi gund em pêşde hatin hetanî me xwe gihande gundê Îskenderon. Wexta me xwest em pêşdetir herin hevalan em dane sekinandin û ji me re gotin ' hetanî em derdora xwe sê

çar rojan keşif nekin kes pêşda naçe.' Me jî weke qûwetê êrişê xwe di gund de bicîhkir şûnde ji bo ku em bikaribin amadekariyên xwe hîn baştir bikin, pêwîst bu ku em xaniyên xirabe yek jî ji wana ji nûve li gor derfetên di destê xwe de avabikin. Ji ber ku çeteyên DAIŞ'ê diketin ku derê ew der xirab dikirin da ku careke din neyê bikaranîn. Lê ruxmî derfetên di destê me de kêm jî bûn, me bi heyecan û coşekî pir mezin ew xanî ji nûve avadikir. Ji ber ku wexta em ji wir derketibana jî me dizanî piştî me, wê gel û hevreyên me di wir de bijîn. Rojên ku me di gundê Îskenderon de derbaskirin, hemu kêlî bi parvekirina bîranîn, xwendina pirtukan û êvarî jî kombuna li derdora agir re me moral lidardixist.

Piştî wê me berê xwe da gundê Antakya. Ji ber ku ez li gundê Îskenderon birîndar bum bi hevreyên xwe re pêşde neçûm. Di vî gundî de jî tabura Ş.Gelî cihê xwe digirt. Hevalên ku em bi hev re bûn û me bi hev re cihê xwe di eynî çeperên şer de girti, yek jî ji wana hevrê Ronahî ku cihê xwe di tabura li kêleka tabura Şehîd Gelî de digirt, ji min re wiha behsa kêliyên ku diketin çembera dijmin de dike; bi boneya 8'ê Adarê me moralek lidardixist. Piştî moral xilas bu dijmin êrişkir û em ketin çem-



bera dijmin. Wexta dijmin êrîş dikir li aliyê dîn jî tenê rêyeke ku dihat gel me, di wê rêkê de jî panzêreke tijî çete berê xwe didin çeperên me yên şer. Xaniyê ku em têde bun jî du qat bu. Yekser me berê xwe da qata dûyemîn, ser ban. Hetanî ku yek çete tenê jî di panzêrede ma me lêda. Hevrê Baran ku dixwest li pêşiya maşîneya teqemeniyê xwe ji bo hevreyên xwe bike mortal, xwe berda jêrê û berê we da maşîneya ku çeteyan dixwest kêliyêk beriya kêliyeke din jiyana hevreyên wî bi dawî bike. Çeteyan di maşîneyê de ruxmî bi hemû hêrsa xwe gule li ser canê ciwan de reşand jî lê hevrê Baran, bê ku li pey xwe binêre bi rukenî berê xwe da rojê û hetanî guleya xwe ya dawî şerkîr û tevî karwanên nemiran bu. Çeteyan tevî maşîneyê xwe teqandin û gelek birîndar û şahadetaên me çêbûn. Hevrê Ronahî û Çavreşê bedew jî di anva wan hevalan dabûn.

Gundê Ewêşê ê ku min cihê xwe di şerê wê de girtiye weke bîranînekê dixwazim bînim ser ziman; êvara ku em ketin gund de hetanî ber destê siharê saet pên-

can me li cihekî ku em bikaribin têde bimînin geriyan. Ji ber ku dijmin hemu xanî xirab kiribûn. Piştî demekê yekîneyeke hevalan hatin gel me û ji me re gotin emê agir vêxin da ku hun xwe li ber zuha bikin. Hevrê Roj hat şuna min cihê nobedariyê da ku ez jî biçim li ber agir xwe zuha bikim. Piştra em derbasî mangelê bun da ku îsrehet bikin. Di wan kêliyan de çeteyên DAIŞ'ê yên ku cilên me xwekiribun berê xwe dan qampa ku em têde diman. Wexta ku Heval Ronahî got yekîneyek heval ber bi me ve tîn yekser di hişê min de guman avakir. Ji ber ku aliyê jê dihatin ne di destê me de bu. Bi gotina min ya yekemîn re hevalan di çeperan de xwe bicîhkirin. Min û Heval Êvrîn jî cihê xwe girt şunde me got ne hevalin lêbidin. Wexta hevalan dîtin ew ne hevalin wan jî destpêkir li wan çeteyan dan. Dagirkerên ku ne dizanîn ji boy çî şer dikin bê ku hesaban bikin bêseruber dihatin. Ji ber ku ewqas derman şixulandibun me çiqas gule li wan direşand jî nedimirin. Yên ku hîna şer dikirin bê ku şerm bikin hevalên xwe yên mirî ji xwe re dikirin mevziyên parastina xwe. Min û hevrê Mazlum di eynî çeperê de cihê xwe digirt. Çeteyên DAIŞ'ê hingî bi awayekî hovane êrîş dikirin ku me her duka nedikarî bi hev re gule li wan bireşînin. Heval Mazlum mecbur ma ku dest bi dagirtina jarjoran bike. Ji ber ku şevreş bu bê ku ez li ber xwe mîyênim hema min jarjorên teji yên pêşiya xwe radikirin datanî ser çeka

xwe. Bê ku ez di ferqê de bim di carekê de li şuna jarjorê min destê heval Mazlum xist şuna cihê jarjorê. Bi bangkirina heval Mazlum ez pê hesiyam ku ne jarjore destê wî ye, hema yekser min destê heval Mazlum da aliyekê û min got; destê te li vir çî digere. Piştî kenekî dem kurt dîsa me berê xwe da dijminê dagirker.

Bi dawîbuna pêngavê re quwet giştî li embara genim kombun. Dema me berê xwe da embara genim a bajarokê Til Hemîs yekser hevalan dîlana azadiyê gerandin û ala serkeftinê li ba dan. Di nava wê koma dîlanê de hevrê Çeko, Seydo, Şoreş, Egîd û Sozdar ku piştra şehîd ketin jî hebun. Bi kelecana û çosa serkeftinê re ne tenê yek sê çar xelekên dîlana azadiyê hatin gerandin. Li aliyekê ku dîlan dihat gerandin li aliyê din jî Şehîd Sozdar, şehîd Amara, şehîd Çeko û şehîd Dilgeş berê xwe dan ser banê embara genim. Çawa xwe gihandin ser ban yekser li aliyekê ala YPJ'ê li aliyekê jî ala YPG'ê ber bi asîmanên Welatê Rojê re li ba dan. Ew kêliyên serkeftinê ji bona wan dibu mîna ji nûve ji dayîkbunê. Çawa ku gera li heqîqetê xebata herî hêja ya mirov be û mirov jî ew hebun be ku wê heqîqetê dikare gengaz bike ew dem, wê tucaran ev rêwîtiye bê rêwî nemîne. Ji ber ku ew dildar û dilsozên welatê xwe bun û soza serkeftinê dabun gel û hevreyên xwe yên şehîd.





## Çavreş Zemanî

# Kobanê Sembola Rûmeta Mirovahi ye

**P**arastina, cîh û warên ku ji bo azadiya wan berdelên mezin hatine dayîn erkeke jênevegere. Xakên pîroz ji bo dewletên dagirker û nijastperest yên weke dewleta Tirkîyê wê bibin goristan.

Kobaniya berxwedêr îro jî li hember dagirkeriya dewleta Tirk ber xwe dide, xwedî rûmet û şehîdên xwe derdikeve.

Di sala 2014'an de li hemberî çeteyên DAÎŞ'ê li bajarê Kobanê berxwedaniyeke efsûnî hate meşandin û di encama berdelên giranbiha serkeftin hate bi destxistin.

Gelek şehîd dan, gelek şervanên azadiyê parçek ji canê xwe da ji bo Kobanê. Kobanê bu sembola gelên azadîxwaz. Li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistanê ji Kirmanşanê heta Loristan, Sine, Saqiz û Merîwanê dirûşmeya “Bijî Berxwedana Kobanî” bilind bû. Jî welatên Ewropa û ji netewên azadîxwaz berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê, bajarê Kobanî. Rojava erdnyariya ku ji bo mirovahî bedel daye ye. Ji ber wê jî 1'ê Mijdarê roja cihanê a pişgiriya Kobanê hate îlankirin. Sînorên ku bi peyman Lozanê hatibû danin ji aliyê gelên Bakurê Kurdistan û Tirkîyê hat rakirin, wek lehiyan mirov herîkin deşta Kobanî. Kobanî, bû sembola Şoreşa Rojava ji ber wê jî Şoreşa Rojava ya tevahî mirovahiye. Niha jî hewceye ku hemû cihan xwedî mirovahiya xwe derkeve.

Kobanê ya berxweder ku bi vîn û sekna xwe pêşengên wek Ş.Rêvan, Ş.Arîn, Ş.Viyan Peyman û fermanar Gelhat û bi hezaran şervanên fedaî yên xaka pîroz, îro bû hebûn. Tepe Dolê ya ku 12 leheng lê şehîd bûn û Girê Miştenûr ya ku berxwedaniyên xwe destan nivîsand, ji bo dewleta Tirk ya hov û dagirker bû kul û dert. Erdoxan digot “Kobanî ha ket ha wê bikeve” lê wek go-

tinên wê nebû. Ji ber ku li ser vê xaka pîroz, şervan û mirovên ku şopdarên heqqîqetê fedayîn gelê xwe hebûn. Tabî kî ala serkeftinê li Girê Miştenûr bi berdelên giran hate bilindkirin. Ev ji bo Erdoxan û hevkarên wî bû binketinêk mezin. Erdoxan xwe di pişt çeteyên DAÎŞ'ê de veşart û êrîşî Kobanê kir. Lê şervanên YPJ'ê û YPG'ê ew çeteyên hov binxistin. Her wiha şîrik û hevkarê wan yê mezin Erdoxan jî binxistin.

Dewleta Tirk siyasetmedar, rojnamevan, gelê welatparêz yên ku piştgirî dan berxwedaniya Kobanê girtin û xistin zindanan. Ev siyaset û senaryoya dewleta Tirk ya sala di 2014 ne bese îro jî ji bo împaratoriya xwe ya xeyalî pêş bixê, bê navber êrîşên xwe

didomîne. Dema ku mirov Dewleta Tirk pênase bike bi kurt û cewherî mirov dikarê wiha bêje: “dagirker, nijadperest, faşist û qirker, hov, dij-mirovahî”. Yê van kiryanan îro dike merîyetê jî Erdoxan û hukumeta wî ye.


Ne tenê Kobanê îro hemû dewerên Rojavayê Kurdistanê dibin êrîşên dewleta Tirk daye. Dewleta Tirk her roj li ser vê axê li pêşiya çavê tevahî cîhanê komkujiyan pêk tîne.

Dewleta Tirk di 19'ê Mij-dara 2022'an de jî bi operasyonên hewayî êrîşên li ser herêmê hîn berfirehtir kir. Heta niha bi hemû cureyên çekan, balafirên şer û yên bê-mirov bi hezaran caran êrîşî bajarê Kobanê dike. Di êrîşên

ku pêk hatida bi dehan şehîd û bîrîndar çêbûn.

Bertekên gelê Kobanê eşkere ye û vê dibêjin “ me ji bo Kobanê gelek berdelên giran-biha dan, em Kobanê tu caran bernadin. Erdoxan nikarê bikevê yek bihûsteke Kobanê.” Kobanê bi bedelên giran ji destê çeteyên DAÎŞ'ê hate rizgar kirin ji ber wê jî parastina wê heman rûhî were kirin. Keç û xortên leheng hemû xeyalên xwe kirin Kobanê û di her kolanekî de destan nivîsandin, wê helbette ew qehramanan neyên ji bîrkirin û ji bo bîranan wan wê her bihûsteke axa Kobanê were parastin.





**Nav û Paşnavê Kod: AVAŞÎN KESRA**  
**Nav û Paşnavê Rast: SÊAL HEYDER**  
**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê:**  
**01.01.1999-QAMIŞLO**  
**Cih û Dîroka Şehadetê: 2018- EFRÎN**



**M**irovahiya bi rûmet bi hebûn û xwebûna xwe tê nasîn, hebûn û xwebûna mirovahiye jî, bi ked, vîn û îsrar tê qezenckirin. Lewra her mirovekî azadîxwaz û xwedî rûmet, bû dildarê azadiyê û wekhevîyê. Jinên resen yên welatê, ji bo serxwebûn û azadiya gel û welatê xwe, her di nava tekoşînê de bûn û li hemberî hemû cureyê bê mafîyê serîhildan, lewma her yek ji wan bûn şoreşger û di dîroka mirovahî de bûn efsane. Hevrê Avaşîn Kesra, ew jî weke jineke dildar û azadîxwaz her di nava tekoşînê de bû.

Hevrê Avaşîn Kesra di sala 1999'an li bajarê Qamişlo ji dayik dibe û di nava malbateke welatperwer de mezin dibe, bi rihê welatperwerî dibe evîndara doza azadiyê. Di sala 2014' an hevrê Avaşîn dibe yek ji sozdarên welatê xwe û di gelek qadên zor û zehmet de, bi sekina xwe dibe xwedî helwesteke xurt ku ji hawirdora xwe re dibe nimûne.

Di sala 2018'an hevrê Avaşîn bi vîn û biryardariyeke mezin di berxwedana serdemê de dibe ji jî berxwêrên welat. Bi dilwêrekî cihê xwe di wê berxwedaniyê de digre û heya henaseya xwe yê dawî, şerê hebûna mirovahiye dike, piştî tekoşîneke bê bempa, a di wê berxwedaniya ku wijdana mirov di-hejand, tevî karwanên nemiran bû.

Hevrê Avaşîn jî weke bi hezaran hevrêyên xwe soz û qesema serxwebûna gel û welat dabû, bi mîrateya ku li pey xwe hêlişt re jî vê dildariya xwe ye welat re teqez kir.

# Xwe Parastin

Nesrîn Ebdullah

Em wek gelê Bakurê û Rojhilatê Surî yê rastî êrîşên pir dijwar tên. Ev êrîşên ku di gelek eniyan de li hemberî tê kirin de bi taybet jî jin tên hedefgirtin. Wekî YPJ'e em bi vê rengî dinirxînin. Çi di eniya îdeolojîk de be, çi di eniya pîskolojîk de be, çi jî fizîkî be, heta derkeftên ku em pê jiyan dikin dixwazin tûne bikin. Ji bo wê jî dive em di van eniyan de, mekanizmaya xwe parastinê xurtir bikin. Em dikarin bibêjin ku di eniya îdeolojîk de, divê em vê yekê baş bizani bin ku, dijmin bombe baranekî hişmendî, çandî û exlaqî li ser gelê me dide meşandin û dixwaze nixrên me yên menewî divê qadê de tûne bike. Bi taybet jî vê yekî bi rêka şerê taybet dide meşandin.

Vê ji bi rêbazên weke sixurtî, hişbir û têkiliyên ji derveyî exlaqê me pêşdixîne. Lê belê divê em li gorî vê yekî hişyar bin, ji ber ku di encamê de em gelekî xwedî çand û xwedî exlaqin. Lê dijmin hewil dide me ji armanca azadiyê û ji xeta me ya xwe parastinê a rewşa dîr bixîne.

Di heman demê de bêbextiyên di asta kompoyê de li ser me didin meşandin. Lê pêwîste ku em divê eniyê de xwedî seknekî pir xurt bin û di her qadê de mertalên xwe yên bawerî, yên îmanî û yên bi doza xwe ve girêdayî, bi awayekî xurt bikarbin. Lê bi rastî jî divê demê de êrîşên ku li

ser me hatî kirin, pir dijwar bûn. Ruxmê vê yekî jî gelê me bi ber-tekekê xurt, bi îdeolojîyekî xurt hebûna xwe diparêze.

Giringe ku em zêdetir xwe kur bikin, xurt bikin û derfetê nedin dijmin da ku heya êrîşê qadên me yên jiyanê bike. Niha di warê pîskolojîk de dijmin êrîşên pir dijwar dide meşandin. Dijmin Pîskolojîyek wisa dide avakirin "Tuyê bi ser ne kevî". Lê belê em wek gelê herêmê û weke YPJ'e em di wê baweriyê de ne ku ji hemû deman zêdetir em nêzikê azadiyê ne. Em xwe-



dî biryarî ku di rêka azadiyê de dimeşîn. Ji bona wê jî, çi leyîstokên dijmin di warê piskolojîk de hebe û bi awayekî li ser me dide meşandin jî, heya niha bi sekin û îradeya gel û şoreşgerên me, hemû hatine vala derxistin û wê were vala derxistin jî. Ji ber ku gelê me xwedî vê biryarê ye. Em dikarin heya dawiyê jî, li berxwe bidin, ji ber ku ne kuştin çavê gelê me dişkine, ne birçî bûn û ne jî wê gelê me koçber bibe. Mînaka vê yekê jî mirov dikare wisa bine li ser ziman; êrîşa ku di şeva 19 û 20'ê mehê de destpêkir, dijmin di xwest di wê şevê de encam bigre û di heman deme de rê li koçberiyê veke, lê belê gelê me jê re got "Eger jiyaneke me hebe wê li ser vê axê be, eger mirineke me jî hebe wê li ser vê axê be" ji ber pîlanê dijmin ew bû ku gel ji cih û warên wan koçber bike. Wekî me ani li ser ziman di gelek eniyên de êrîş dikin lê ji aliyê civaka me ji her qadê ve bertekên mezin hate raberkirin.

Pêwîste em vê baş bizanibin ku bi rastî jî, em wek YPJ'ê jî, wekî tevahî hêzên xwe yên parastinê jî, em xwedî vê zanistiyê ne, ku emê dev ji xeta xwe ya parastinê rewa bernedin. Wekî ku me anî li ser ziman û emê hertim jî bînin li ser ziman, em xwedî dozekî heqin, em xwedî dozekî rewa ne û em xwedî vê zanistiyê wê ne jî. Ger wan ev cihan hemû jî anî li ser serê me, emê xwe biparêzin. Lê belê hêza giştî cihanê di destê me de be jî, em êrîşê kesekî nekin.



